# Şevên bêlezet

Helbest:

Elî Bendî

2022

■ Navê pertûkê: Şevên bêlezet
■ Helbest: Elî bendî
■ Derhênana hunerî: Hekar Findî
■ Berg: Ebdulrehman Bamernî
■ Tîpçinîn: Herman Êkmaley
■ Jimara spardinê: (D-/2777/22) Pertûkxana Bedirxanîyan - Duhok
■ Çap: çapxana…..
■ Herêma Kurdistanê – Iraq 2022

# Naverok


**Xerîbiya 'eşqê** ........ 5

**tabluyekê çiblaq** ........ 7

**here xayîn** ........ 10

**Peyvên kehîkirî** ........ 13

**Sema şevê** ........ 16

**duhî û evro** ........ 19

**bêzar bûn** ........ 21

**nivêja 'eşqê** ........ 25

**Şelandina hizran** ........ 28

**Şevên bêlezet** ........ 30

**geşteka romansî** ........ 33

**niqruskên dilî** ........ 36

**hevrikiya jiyanê** ........ 39

**evîna leqday** ........ 41

**ez û şeva yelda** ........ 44

**selam di nav papura geşta omêdan.** ........ 48

**gerîdên xewnan** ........ 55

**ez û kirîsmis** ........ 58

**Hizreka ve we randî** ........ 63

**Maçên nîsek** ........ 66

# Xerîbiya 'eşqê

Bîranînên min

Bi wan dehmenanve

Bûyne benîşit

Di lîskirîne ,

Şûyn pencên min

Evan tiblên weku pembî

Li rex û durên

Mijîlanka

Bûyne sîtafik

Difêr kirîne ,

Wêrekiya min

Di nava naxê teda

Germatiya wî leşê vil

Xerîb naken

Di aşitkirîne ,

Di tablûyê munalîzayê da

Ez û tu êk giyanîn

Di xeyal û yadgariyan da

Êk ariyanîn ,

Di nav memleketê

Evîndaran

Em serkêşîn

Serqafîleyne

Di xuragiriyê da

Emi qorbanîn

هەوالنامەی کتێب

# tabluyekê çiblaq

omêdên min di geli te
herê di geşin
maçên nîsek
Jivan lêvên peçrîmekrî
bu şiwîrha
bersîngên te
çipik çipik peyvên
şermîn yê jê
di peşin ,
şiwîn tiblên min
li wan paxla
Ji bê gunehî û kelêjana
'eşqa fîriyay
yê te di gezin ,
çavên min riku rik

هەوالنامەی کتێب

bu nêçîra wan paxlên xir

di çiwar çuvê tabluyekê çiblaq kirî

li kêleka romansiyên

şevên te yên hêç

hêdî hêdî

bu nêçîra xu

yê di meşin ,

befir fê'la xu nahêlît

min suz ya day ve şelandî

bu hembêzu alsîna

wan gumbeta

min sitêrka xu lê girtî

li ber birîsiyên

'eşqa mina ne vehewiyay

şevbêriyên xu

bi kime tewaf ,

he zên min

bu bihênvedana şevan

کتێب هەواڵتمەی

di birsîne

her dev beşin .

هەواڵنامەی کتێب

# here xayîn

Piştî ji te
Bêhîvî bûym
Hemî tişit te
Ji min sitandîn
Di navbera min û te da
Çi tişit neman
Peyvên min
Di tumara evîndaran
Bi pifekê te jêbirin
Pirt pirt kirin ,
( here xayîn here wêve
Ya tu di key ne evîne )
Bîrhatinên te
Di bîrdanka hizrên min da
Bune erşîf

Bi nameyeka masincerî

Te ez qayîl kirim

Bê deng kirim ,

Kiriyarên yariyên şevê

Te kip kirin û givaştin ,

Te ez kirme

Qewalekê valincîbûy

Ling lengeru

Ji bêhina vînê dûr kirim ,

Ji hezên te yên zîz û silisluk

bi goman keftim

Têkelî kiriyara nebûn

Hemî bûne hilim û serab

Di nava çîrokên pîr heviyanda

Di nav papûra xewnanda

Li deriya îce

Te hingaftin

Hîviyên min yên aramgirtî

Temrandin

Di ber avê da birin

Raste ku ez baruve me

Ne hêzeka bi gef û gurim

Rewiştê min ne tulve kirine

Nihêniyên te dê parêzim

Hestên min ji xu nagrin

کتێبی هەوالنامەی

# Peyvên kehîkirî

Peyvên min

Sitêrka girtiye çav û birha

Vê nîv şevê

Te azrandin,

Te ez kirime ekterekê

Di ramaye ka şev perês

Di bagrawendê kevalekê

Ji grinjînê nexşandî,

Peyvên min wek kun zivîrik

Li dûr xu di zivrin

Li bere li ser wan

Mi jîlanka lîs bi bin,

Yaweş yaweş

Bi xafletîve

Bu baweşa wan lêvên li pil

Xu mêvan ken,

Hebûna te di nav peyvên min da

Hizrên min serxuş di bin,

Li cîhana evîndaran

Li  êvariyên tav zerkî da

Li ber sema şilqavên

De riyayeka pêl havêj da

Di kevît lîtka

Ariyan leşê min digezît

Di semta xuş û lezetên

Wî sîngê gir û virda

Di gel maçên nîsek

Bi destnivêj da

Xu ji bîrve di ben,

Bi van peyvên kehîkrî

Yên sinurdar

Rujgarên me li perisitgeha

'aşqan di

Li wargehê dîdarên me

Dê pêjan kem

Evîndaran

Dê padaşit kem.

هەوالنامەی کتێب

# Sema şevê

dinav gêriyên pirêza

'eşqa teda

Min û şevê berîkane,

Li ber runahiya gelavêjê

Vê nîvşevê

Li bê dengiyê

Wek teledînek

Semayê di kem,

Li rikmaniya xu peşêman di bim,

Di gel bîrhatnên xe yalên xu

Bu vê şevê

Ciwaniya heyvê

Ez digirnijim,

Ji keyfada hemî tişta

Pîroziyên me

هەواڵنامەی کتێب

Di kime tewaf

Hembêz di kem,

Ji ruxsara birisqêna

Şilxên sitêra

Ez wênê te ... Bi razandîve

Di nav da di bîm,

Heyv û stêr

Jibrisqînê yê di bistirin

Bu 'eşqa me yê di lurînin,

Diyaluka min û şevê

Ez fêr kirim

Ewê şerma gîrhe girtî

Xu ve nîsandî

Kiz bi kem û

Di hevkêşa van şevên

Bê dengiyê da

Bi bime pale wanek

Di mîhraba 'eşqa teda

Lîs bikem û

Di bê deng bûna şevê da

Gelek gelek

Ji texe rîb bi bim,

Li fêrgeha 'eşqa min û teda

Hemî 'aşiq

Hişiyar bi bin ... Bu min û te

Di xilwê bi çin.

هەوالنامەی کتێب

# duhî û evro

Heta duhî

Ez birbra şureşê bûm

Ez parzînk û nanpêjiya

Pêşmerga bûm,

Balavçiya xakên wan bûm,

Sutemenî û xuragirya

Xebatê bûm,

Ez runahiya çirîska

gula tivengê bûm

Pişkuja omêdan bûm,

Li gir û çiya û nihala

Wekî kewa ez di qebîm,

Evro ke jî

Li berdîwar û kulankên

Mizgefta mezin

Di gel parzînkê xu

Bume peyker

Ji vê jiyana direw

Heta heta bê omêd bûm

هەواڵنامەی کتێب

# bêzar bûn

Here buhar
Heşte nakem
tuheyveka silsilukî
car ya bi kenî
Car ya bi girî
Reftarên te drewînin
Negul geş dibin
Ne dilve dibin,
bi şirya xu te çend kuvan
di gel xu brin
Çend day gurî
Bin ax kirin,
Şîn û şadiya
Dazrînî û darînka dibî
gefa dikey

هەواڵنامەی کتێب

Rundik û grinjîna

Ji dil di peyvînî

Hîviya diqersînî

Min bêzar di key,

li bîra te ye

Helebçe jî te

Şehîd kir û gurî xemla xukir,

'umerê xawerî te hingavt û

Ji defme barkir,

Adarûkên li nav ne hal û

Serên giru zîrka

Te kuzrandin,

Te xu ne girit

Hîngê rastiya

Li mehabadê

Di nav perasiyên çiwar çira da

Qaziyê kurdan

Li sêdare da li jiyanê mitkir,

هەوالنامەی کتێب

Li bîra te ye

Li ce zayrê li nav 'ereban

Di nava kuçka bumêdiye da

Ji piştê ve

Te xencerek li pişta min da,

Here buhar heştenakem,

Te ne hêla bi serhildanê

Xuşiyapê bim pê şad bibim

Jiwarê xu revîm be zîm

Te teqandim ...li çe mê cî li rêzkên mêriya te hingavtim,

Li çel û deştana rawestandim

Li kulanên biyaniya

Ez şeqandim şeplandim,

Ji ber hindê

Çi bite nakem

Heş te nakem...

هەواڵنامەی کتێب

# nivêja 'eşqê

xoziyên min
yên qeyre bûyn
ew miyên bi pirça minve
te buz kirin,
piyase û dûkêla cigara min
li ber çibkên vê barana
ne ya ji dil da
dîdevanin,
di gel kum
li rêza êkê
li nivêja 'eşqê
Dê çiklim
Heta kefîşe bi de vê
Min da şurbît
Du'aw lavên min

هەوالنامەی کتێب

Yên cudane

Di veşartîne

Bu hembêza dîdara te

Di navkelêjana

Hinavên 'eşqa kehîda

Çave rêne,

Yadgariyên min li pirêza

Me îdana sîngê te da

Hêc bûyne

Bu min bûyne persitgeh û malbat,

Dê wê hesta

Di şev perêseka vînusî da

Bi hêvênê bîrhatinan

Xu gerim kem,

Wî leşê serxuş û

Kêleka nerim

Hevîr tiriş kem,

Efca were sultana min

هەوالنامە کتێب

Hêşta hezên min
Xiriş ne bûyn,
Hestên min weku pelê  herê digeşin ,
Bu mêyatiyate ..... We ku
Hespek kihêl
Herê dinêrin,
Zevlekên  min
Ji bêzar bûnê her ji nuke
Xuriyan vê kefit
Yê dazirin,
Ji havîbûnê te zivrandim
Wî sîngê ji mêje
Jalîsanê şîrve kirîm
Carekadî kehîkirim

# Şelandina hizran

Hizrên min
Bû nêçîra hezên te
Yên sitewir bûyn
Wekî berê ji vî dilî
Bê destûrî
Dernakevin,
Min dil bute kirbû
Şemalik
Li ber şulih û runahiya wê
Vîn perîs bî,
Min nezanî ji nişkekê
Dê jesmana êye xar
Xu şurkey
Qalibê min,
Dê baruve û babelîskên

هەواڵنامەی کتێب

Kerib û kînê

Di gel xu înî,

Bi pifekê wê runahiyê

Dê vemrînî û

Evan hizra dê şelînî.

هەواڵنامەی کتێب

# Şevên bêlezet

Eve çenda rû qaymî
Hey sêrbenda
Şevên teysuk,
Hilim û bêhin û qid qidanka
Paxlên xir û xuhday
Di renge şevên
Baranî da,
Li kelêjana 'eşqa fîriyay
Li vê buhara axlêve ya
Evîndaran
Tu min hî di key
Bu hezên min
Di bemze,
Li şevbêriyan
Di gemrandin û perxandina

هەواڵنامەی کتێب

Wî leşê vil

Ji xerîbiyan

Ez hilbaskî

Kêlekên te di bim,

Ev lêvên şil û yên li pil

Qîd kene bêlezetiya

Bu hembêza çerandina

Wan şemamên

Xunav girtî

Fir kirina maçan

Di şev perêsên şûym da

Bi çiblaqî  ... Ge hên

Leşê min zivir di bin,

Ez heş şevên

Bêlezet di kem

Bi şelandîve

Bu pîrûzkirina viyaname

Xu nêzîkî

Bejna te di kem,

Wek daralînk

Hemî caran

Xu di tewer di kem

# geşteka romansî

Hemî rojên min viyanin

Berperên bîrhatinên min

Hemî têda wênên te ne

Xîvetek di nav dilî da

Min ya veday

Bu bêhinvedana hizrên

Westiyay

Vî qer qudê şekirê girtî

Xerîbiyê dîtina te ne,

Şivêdî bû

Min xewneka xapînuk dît

Bu nav sitêran bilind difrîn

li tuxîbê evîndaran

Sinurdaş bûyn

Me geşteka romansî di kir

Mirin me di kuşit

Bûyn hevalcêmik

Gemiya nûhî

Me niwîjen di kir,

Me hevrikiya jiyanê di kir

Li mîhraba perisitgeha

Mem û zînan

Li burca belek

Li danga cudê miraza

Dixilwê diçûyn

Me sucde di bir ,

Bi bazbendeka extubarê

Me xu di pêça

Li wê wêsitgehê

Hezên min û te bûne cût

Li êk tişqilîn

Ariyan keftê

Min şinî zanî

Ezê bi şensim

Bextubarim,

Ji evro pêve

Bû dûriyana sîngête

Bu wê duba bi lêvên te ve

Bi vê bêçare yê ve

Min jivane...

## niqruskên dilî

ji zarokîniyê ezê fêrbûym
ka çi rengê gula
dê hejê kem,
dê çi tamu têjê
ez dê jê kem,
çi curê belatînka
li sernafka gulên bêhin firî
dê mêvan kem
dê li ser lîskem
evîndar kem
ji zarokîniyê ez yê fêrbûym
perwerde bûym
li şevbêriyên dirêj û xuhday
bi lewendiyên negrêday
li ber awazên

heyran û şeverûka
li ber sitranên
axeban û ber berûşkên
xanîkên gije bera
li ber gurme gurma supa dara
di nav sîngê befra bê wefada
xu bigevêzm
ji hîngê were
bêhna te ya ji leşê min di hêt
henasa min ya fireh bûy
ezê keftîme di telha teda
ez ser pişkim
li ser şemilika mîhraba evîna te
min soz ya day
ji hemî tişita xu sil bikem û tube bi kem
tinê xu bute bi çemînim
bîrdanka hizrên dilsoziya min
yên cisaret bûyn

di vî werzê axlêve yê evîndaran
bu hembêza leşê te
bi subeyeka nexrîn
beref te yê di tehsin,
xane yên şana hestên min
yên tijî bûyn
arûnka digrin,
di gel niqruskên ser xuşiya min
têkel bûyne
li ser pîroziyên leşê te
alleh akber vê ariyanê
di helmirîsin,
arûnkên min
bê deng di ken.

# hevrikiya jiyanê

futu yên min
di elbuma yadgariyan da
min kirbûn miştax
li ber davên te'rê
nîvroyeka bêzar
xolîkî bûn,
ew diyaloka li rêka
Evîndaran
li deriyê miraza me vehandîn
Ji nişkekê ve te lewtand,
hestênvî 'aşqê şêt
Xaru xwîl bûn
di mîhraba 'eşqeka bê tam
te helawîstin
li sêdare dan,

xewin û xuziyên

vî 'aşqê xişîm

te li bin kuçkekê

tijî pel û bizot

te kelandin , hilme babûn,

he dara min

di gel serbûrên min

yên sitewir

xafle nabin

bîrhatnên min

çi car hişik nabin

mîna sumbuleka genmê

yusifîne

Bêzar nabin..

# evîna leqday

Ew evîna te serjêkirî
Li bin kefşên xewnên şevan
Te nivandîn
Hemî hîvî û xuzî
Te şelandîn
Suzên caran te nixaftîn,
Baş bizane her ji nuke
Ne xazukim,
Xuragrim
Ez dê hemî dera girim,
Hezên min jî bi te hesiyayne
Demeke ji cîhana şermukî varîbûyne
Evê carê wekî caran
Nazivrin û
Ji te aşit nabin

Ev hezên hedirkûîy ne

Di bin xuve çûn

Di silislukin

Leqdayî ne,

Miştî suzên suzdarane

Ji dîrve qeba di xazin

Bêhna kerbê di helkêşn

Qêjya ve dde ni

Bu rikmaniya te

Evê carê tewîka den

Yê hêv dikene

Fêlbaziyên te

Carekadî min serda neben

Hestên min ne herfînin

Peyvên min ne hermînin,

Pa jû deşte

Min bawerî bi suzên

Payza nîne

'ewr û baranên bi hara

Di bê mfane

Yên bi kenîne

Te bi kevlujankek dû ryatî

Xu rapêçaye

Bi suzên xapandinê

xu we rpêçaye

Bi fêlên xu

Min nêçîr bi ke

Hestên min brîndarke

Xewnên min serjê bi ke

Lê bizane

Baş hêvbikê

Ez ne ke wê davên te me,

Bû evîndaran

Ez gizîrtekê aramim

Hestên min têra xo he ne

Bi ser min ve ne...

## ez û şeva yelda

Şev yeldaye
Şeva xatir xastina payzêye û
Şeveka kude taye,
Şeva min bi kurtî derbaz bû
lê şeva min geş û rûne
Ji barûvên befr û barana
Ji gir gir û şirîvênên
'ewr û birîsiyên
Vê kude taya zivistanê
xu naden paş
natirsînin,
Şeva min di ber
denig û şepeşepa
gijluka girya payîzê
Semayê di ket,

Şeva min
Ji ruxsar û çirîskên
'eşqeka dijwar
firşik  bûye,
Şeva min rewişte
bawernama jiyanê ye
rûnahî ye bû 'aşqan
li ber awazên ufînên dilê min
Semayeka xurandî di ken,
di şeva yelda hizrên min
Şepirze di bin
bu ser sîngê te bijalle di bin
peyv aviz di bin
xwîna ne yarên 'eşqê
Fir di ken,
di vê şevê da
Ez di bime befreka sipî
xerîb girtî

bû 'aşqên be xîl

li bilindahiya kumtên bilind

xu li hişar di dem

vedinwîsinim,

wek suprayzek

bu terkirina lêvên têhnî û

Şewhetên şevê

ez silav di ke m,

ewî sîngê

wek ciwaniya gelavêjê

bû dehmenên çavên min

Buyne kevalek rîs

neşên têhna min bişkênin,

ev şeva min , şeva yelda

ne şeveka wekî şevan

Ya şermîn û kîfkuy ye

Ya çivêle,

Şeva mina yelda

Ya şembuze

Hêrş birne bu sîngête

da gunehên xu

Bi şilqav û peqîşkên

maçên vere sandî

Tafîl bi kem...

# selam di nav papura geşta omêdan.

Kekê selam....

Eve ez çum biyabanên

'er er û nugre selman

Wan hestîk û kiluxên sera

Bu te wek diyarî bînim,

Berî bçim tu bi xudê key

Guskekê tijî rondikên kel û zelal

Bi gehîne min

Da li ser gorê bab û bi ra bi van destên tafîr krî bi reşînim,

Bêje dadê xuragirbe

Salên bûrî dê bi berhem bin bi herwe naçin

Tuvê xuragiriyê û tulvekirinê

Li kavle gundê wêrankirî

Bi pestala axa warê min

Lewtandî heramkirî

Kurê te yê hinde sale

Bu xemên te rîhnetraşîn

Ez dê çînim û berhem înim,

Kekê selam....

Eve ezim gehiştime

Biyabana bê dîn û wijdan

Berê xu bi dê

Evî girê hinde mezin

Hinde drêju yê bi bejin

Dê kelêşim

Hiru bayê deşit leylana xwê kirî

Li nigre selman û şamiye

Li 'er'erê

Bersîngên wê ezdê girim

Ax û fîxan û nefretên te

Ewên kerbê girtîn

Ew mîyên te bi wan

Lam û siwîretên pif

Hinde sale te buzkirîn

Dê kem bi zut

Dê kem gule

Bu qesir û vilên enfalkaran

Sitêrka xu dê lê girim,

Kekê selam....

Were bêje  kerib girtîme

Ez heligrê peyameka birîsîme

Ez elhuyê binara çiyayê metînî me

Tu xu bi ke hespemarek

Kezeba xu ya jehir kirî

Tu pavêje ser dîwar û ewan şuyirhên bi hestîk û kiluxên serên

Enfalkiriyan avakirî

Ewên tu ji hembêza bab û bira û çiwar çelê bêbar kirî

Bi be reşe 'ewrekê bi miju muran

Li hindavî qesra sultanî gefa bi ke

Seyên wan yên har û devbi xwîn lixav bi ke,

Kêlbetîjên li terşê te buyne xudan

Wan serşura bi jehra xu pêve bi de

Ew tifa ji nav lêvên te di peşît

Bu nav çavên enfalçiyan peçrîme buy

Pêve qersî

Bu dîroka şermezara mrovatiyê bî

Bi ke helamet

Roja teye hevalê min

Tula bi ke,

Kekê selam...

Ez baş dizanim jimêje ye

Tu ser karwanî

Jiwan çava ya diyare

Jiwan penca ya diyare

Jiwan sozênte ya diyare

Tu yê buye şaswarekê

Çak û çelenig,

Çandkê xemên

Ewan daykên ceger kuzirî

Dê helgirî

Wek brîsiyê li hindavî

Kelha nizarkê û nigre selman

Li 'er'erê û selamiyê

Li tupzawe tu dê firî

Li şiwînwarên kevnar

Yên xwîn û

Li derazînkên kelhên zurdar

Dê xuşurke li dûr zivrî,

Çi tuv geşteka ciwane

Çandik te helgirît

Ti jî hîviyên badînan û
Barzan û helebce û germiyane,
Kekê selam....
Tu bi xudê ke
Tu bi mezarê şêx pîramuske
Di vêgerme geşta xuda
Here şingal
Here mala dayka şemê
Tu silav kê
Sucdê bu bi be
Rondikên wê bi rawestîne
Ewê be jinê û tidareka
Reş bu bi çe mîne
ew kula mezin di nava dilîda
Derman bi ke
Hêdî hêdî xunerimke
Tu yê bi destinvêjî
Tu heyranî

Bilurvanê karwanê şehîdanî

Bi dengekê nzim bêjê

Em êk nivşîn

Zeredeştîne!!!!

## gerîdên xewnan

Tu ya li pişit çyayê qaf

Di nav 'ewran da

Wekî ejde hayekî

Xu wer ba di dey

Ez jî siyarî papurekê

Di nav deriyayek pêl havêjda

Niqum di bim,

Tu ya li pişit çiya yê qaf

Tuvê tulve kirinê di çinî

Bi tîq tîqanê

Xu ji bîrve di bey

Gevizkanê di nav

Giriyê da di key

Di gel eskîmuiyan

Diçiye ravê

Bi hemî renga xu di gihurî,

Ez jî di nav evê

Papura xewnan da

Hîviya di keme kezî

Car caran jî

Di bime serteşîkek

Bi zelalî hîviya di çînim,

Li wê qurneta zulim û tarî

Tu ya buye penaberek

Benda xewnên qersî

Wek çeqeluza

Semayê di key,

Bi fêlbazî û cembazyên xu

Bi qurnicîka ... Xu

Bi rîndar di key,

Bexitreşiya xu

Li qinare di dey,

Tu ya buye hêlîvanka

Pîvazê

Di xeyalan da

Kesîre di bî,

Ez jî yê bûym

Gerîdek û hîvîdarek

Li ser şaperên

Sîmerxeka kehî kirî

Li dewis û şupa

Mace lanî

Xu di gehînme

Wê qurneta hîviyên

Berze

Ewî bextê hinda buy

Bi zivrînim...

## ez û kirîsmis

Li ber kinarên vî hişkerûy
Digel xeyallên xu bitnê
Li semta vê taryatyê da
Piyasa dikem,
Hizrên min he mî yên qifil bûyn
Di gel birînên ezman surkên
Vî bajêrê xe wê pêçay
Kabîsî xu biser daday
Li ser lifkên şemilka xu
Li qame ta nivêja direnig
Nifrînan di kem,
Kirîsimse
Hemî hizrên min dimrîne
Diyaluka min digel şe vê ye
He virkiya min digel rojê ye,

Di nav gêryên evê şe vê da

Veder di bim

Di nav gêleşuka xewnanda

Xu vedişêrim,

Desit û dilê min nagrin

Daşup û xe yalan da

Lava bikem,

Evê şe vê

Dê xu deme ber çibkên xerîbiyên

Xonava peqîçkên

Ser lêvên te

Şerabekê ji 'eşqe ka

Çiblaq û rus

Ji têhna hilma 'eşqa nemir

Bu şevbêriyên me

Dê jê çêkem.Hizreka ve we randî

Çil wî we latî bkem

Yê min têda cihek ne bît

Ez çi  li wî warî bikem

Mafê min têda yê be rze bît

Çi bêjme wê axa he

Ya bi pistalên

Bê wijdan û cerde çiyan

Bê desitnivêj buy

Le wtandî,

Çi li wê muze xanê bikem

Ya bi qêjîyên paşaye ka

Vî bajêrê enfalkirî

De riz ke fitînê

Ke vale kê bê renig

Bê xatir xastin

Ji rundika xu nmandî,

Xu nade me li jêr sîbera

Wî tabluyê tris û sehmê

Ji dîmenên dar qespeka
Biyabana bê wefa
Xu nexşandî,
Çi li wê azadyê bikem
Ya xewnên min li qinare  dayîn
Çirayê hîviyan tarîkrîn
Berhemê miştaxa
Sale hasal
Kabraye kê enfalçî
Talan biket
Lê bi bît xudan,
Ez xucihê vî welatî
Bibme revenid ... Bajêrê min
Bu min bibît zîndan,
Libe risema
Brisqêna sitêran
Şihîna şêran
Dixe û di çim,

Jişerma 'eşqeka

Se rabgirtî

Têm hingavtin

Qalbê min diseke ratê da

Ji dil sutinî da yê di bihujît,

Li 'eri 'erê

Di nav gumên xwêda

Di kevît lîtika,

Bi nînuka cergê biyabanê di kulît

Ji ber qêjiyên qer qudê min

Deşit û çiya

Hemî hijyan..

# Hizreka ve we randî

Çil wî we latî bkem

Yê min têda cihek ne bît

Ez çi  li wî warî bikem

Mafê min têda yê be rze bît

Çi bêjme wê axa he

Ya bi pistalên

Bê wijdan û cerde çiyan

Bê desitnivêj buy

Le wtandî,

Çi li wê muze xanê bikem

Ya bi qêjîyên paşaye ka

Vî bajêrê enfalkirî

De riz ke fitînê

Ke vale kê bê renig

Bê xatir xastin

Ji rundika xu nmandî,

Xu nade me li jêr sîbera

Wî tabluyê tris û sehmê

Ji dîmenên dar qespeka

Biyabana bê wefa

Xu nexşandî,

Çi li wê azadyê bikem

Ya xewnên min li qinare  dayîn

Çirayê hîviyan tarîkrîn

Berhemê miştaxa

Sale hasal

Kabraye kê enfalçî

Talan biket

Lê bi bît xudan,

Ez xucihê vî welatî

Bibme revenid ... Bajêrê min

Bu min bibît zîndan,

Libe risema

Brisqêna sitêran

Şihîna şêran

Dixe û di çim,

Jişerma 'eşqeka

Se rabgirtî

Têm hingavtin

Qalbê min diseke ratê da

Ji dil sutinî da yê di bihujît,

Li 'eri 'erê

Di nav gumên xwêda

Di kevît lîtika,

Bi nînuka cergê biyabanê di kulît

Ji ber qêjiyên qer qudê min

Deşit û çiya

Hemî hijyan..

# Maçên nîsek

Li de razînka

Wan qulaçkên

Sîngê giruvir da

Baş hêv bi kê

Evî tiblên min

Wekî pencemur

Wekî mîratgir

Di baweşa hêcbuna

Vîsnêleyda,

Ji dehmenên te

Ve nabin,

Bîrhatinên min

Yên lîskirî

Min hawîş di kenî

Min ji bîrve di benî

Xewin û hez rikmaniyê
Di ken
Tevlî hevdi bin,
Bu hembêza paxlên
Niwîrhe jê çuy
Di be rîkana te le dînan da
Şertanê û qumarê di ken
Şiwîn lêvên min
Ji bê gunehî
Lê nîsek di bin